Dumahêk: Bîranîna .....

berê xwe nedaye xwendevanên Ereb, lê ji kurda bi tenê re derketiye, ew pirtir pêdiviyê xwendevanên Ereb e. Rojnama Erebî jî bi rola xwe derbarî pirsgirêka kurdî nerabû ye .)

***Şêx Murşid Elxiznewî**: (*Ez bi navê xwe û bi navê malbata xwe sipasiya vexwstina we dikim, ji ber ku rola Rojnamevaniyê di xebata miletan de gelek pêwîste. Lê hîn ya kurdî, ne li gor bûyeran e. Gerek guhdariyê li Yekîtiya kurd bikin, di vir de, rijîman zimanê kurdî qedexe kirine ji ber wilo çanda me bûye bi zimanê Erebî, di fêrbûna zimanê kurdî de em xwe şagirtî dibînin, gerek tuştê li mero buhurtî be, mirov lê vegere û şaşiyê serast bike.*)*

***Bessam Elte,éan* :(**sipas, ez xêr û xweşiyê ji we re dixwazim,ez dibînim ku kêmasiyên rojnamevaniya Erebî gelek hene, wê ji bilî xwe pêve, guh nedaye tu kesî, ta nivîskarên wê jî, tu dibê qey ew parsê li ber dergehê rojnamevaniyê dikin. Ez di rojnameyên kurdî de amademe binivîsim. Berî nih, min beşdarî di rojnamekê de li Erbîlê dikir ,dawî her sal rojnama kurdî û miletê we yê leheng di xweşiyê de be.

***Evîn Şikakî**:* (Di pêşî de, pîrozbahî ji nivîkaran hemiyan re ,ez bi hêvî me ya Erebî jî em bixwînin,kovarên me ji berê pirtir in, ji ber kurdistana Iraqê arîkarî daye me ,em dixwazin hêz tev bibin yek, û arîkarî bi pîrekê re bibe da ku pêşkeve.)

***Hêminê Mindanî**:* (Ciwantirîn silav ji rojnamên kurdî re, û ji malbata Bedirxaniyan re, ji ber ew li ba min bavê çanda Kurdî ne, ez paşeroja kurda wek çirîskek ronahî di nêv ewrekî tarî de û weke tîrêjek geş ez pê dil xweş im . Rewşa çandê, bi rewşa gelê me ve girêdayî ye, ez bi hêvî me yek û yek dengiya tevgera kurdî wek diyarî em bidin gelê xwe.)

***Xalidê Cemîl** :* (Ev rojeke şahî ye, nemaze hevdîtina rewşenbîran ji hev re di vê rojê de, rojnamevanî bi rolek mezin derbarê mafên kurd û kurdistanê rabûye. Lê reşwşek xweştir jê re pêwîste çiku bi gelemperî ew di asteke kêm de ye, ji ber pispor di vî warî de ne hatine peydakirin, ew bi çakbîniyek xweş û hêja û hêviyek mezin lê dinerim û kêmasiyên wê nabînin.)

Mihemed Qasim*: (-pêşî pîrozbahiyê li gelê kurd dikim, li her deverên kurdistanê. Hem sipasiya her kesê ku bizav di ber fistîvala rojnamegiriya kurdî kiriye, çi bi folkilor û huner, çi bi raman û lêkolîn û bi amadebûnê jî dikim,...bi hêvî me ku her gavê werin bihtir li pêş bin.ji aliyekî din ve, têtе xwestin ji rojnamevanê kurd, ku karekî zor bike heta bighe avakirina kesayetîyeke azad û serbixwe.*

- pêwîste ku rojname serbixwe be, ji alî partiyan ve bête ragir û pişgirtin, wekî ew kar di xizmeta millet de ye. heger di vê rewşê de bmîne , bê guman, wê bibe rojnameyek rotînî, weke her welatê şûndemayî, û her rojnameya rûtînî bê sûd û mifa ye .- riya pêşketinê xuya ye: Hevkarî, hevpeyvîn, zanistî, dem buha bibînê, bi rêz li millet binêre û peywndiya bi her lextê millet ve girêde.. Ev jî, hinek mêranî jê re gerek e....!! ***D.R (15)***